**QURSA İNCİLÊ**

- Ev qursa ku çavkanıya wê İncil e û jı deh bırri pêkhatıye bê pere û bı tûmi serbıxwe ye-

**BIRR 6**

NAVNİŞANA WE:

PAŞNAVÊ WE:____________ NAVÊ WE___________ TEMENA WE_______________
KUÇE Û NO:________________________________
NUMRA BAJÊR Û_________________________
GUND/TAX/BAJAR__________________________
WELAT AN Jİ KOMAR________________________

Jı Nuh Ve Bûyin Û Rastıya Xwedani

1. Hemûya mırovan gunehê kırın û jı ber gunehên xwe mıri ne (Efesıyan 2, 1) Bo vê dıvê jı nuh ve bızên (bên dınê). Ev bûyina ne cısmani ye lê belê dı dılê her kesên bawerıya xwe bı İsa Mesih ve anine bı navditıya Ruhê Piroz ve dıbe. Yeki ûsa, jı mırınê derbasi jıyanê dıbe (yanê dıgıhêje jıyana nû). İncil jı vêya re "Jıyana Bêdawi" ji dıbêje (Yûh 3, 16)

PIRS Û BERSIV

Jı kerema xwe vê dera vala bıhêlın

1-) Çıma jı nuh ve bûyin hewce dıke? (Yûh 3, 3 û 5)

2-) Ma gelo hew mırovên ne durıst hewceyi bûyina nuh ın, ya na mırovên durust û oldar ji?

3-) Çı heq jı kesên ku İsa Mesih qebûl kırıne û bı navê Wi bawerıya xwe anine hatıye dayin? (Yûh 1, 12)

4-) Çavkanıya jı nuh ve bûyinê ki ye? (Yûh 1, 13)

5-) Ki jı nuh ve bûyina bawerkır peyda dıke? (1.Pêtrûs 1, 13)

6-) Tova jı nuh ve bûyinê çi ye?

7-) Ka we jı nuh ve bûyinê çawa fêm kırıne, jı kerema xwe lı vır bınıvisinın:

2. Rastıya Xwedani

Dı nameya Rom, dı navbera bırrên 3 û 5'an de ev babet tê qal kırın. Em lı wır dıxwinın ku, mıroveki bêsûc, bona ku xelasıyê jı mırovên bısûc peyda bıke, tê darazi kırın. Belê, bı rasti ji İsa Mesih bêsûc bû; lê belê Wi berdêla hemûya sûcên mırovan da û jı alıyê Xwedê ve hate darazkırın. Nuha, em mırovên gunekar, emê bı saya Wi bıkarıbın xelas bıbın. Heçi kesên ku bawerıya xwe bı Wi anine, mina ku qet gunehan nekırıbın dê bıghêjın Rastıya Xwedani.

Pırs û Bersıv

Jı kerema xwe vê dera vala bıhêlın

1-) Mırov bı çı pak dıbe? (Rom 3, 28)

2-) Em bı navdıtıya ki pak dıbın? (Rom 3, 24)

3-) Ma gelo hewceye ku kesê pak bıbe, berdêla wê bıde? (Rom 3, 24)

4-) İsa Mesih, bona ku me xılas bıki çı kır? (Rom 5, 9)

5-) Kesê ku pak dıbi, dıgıhêje çı? (Rom 5, 1)

6-) Çawa tê zanin ku yê hatıye pak kırın wê jı çı (belayi) xelas bıbe? (Rom 5, 9)

7-) Kesê ku pak bûyi, dê bê darazkırın? (Yûh 5, 24)

8-) Gelo jı kesê ku pak bûyi re mahkûmiyet heye? (Rom 8, 1)

9-) Me dı bırra 1, bûyina nû, dı bırra 2. ji pakbûnê ditın. Bı vi avayi, lı gora wan bersıvê bıdın... Gelo mımkune ku kesê pakbûyi bıçe dojehê an ji wi jı destê Xwedê (û İsa) bıkarıbın bıgırın û bıstinın?

10-) Gelo yên ku bawerıya xwe bı İsa Mesih ve anine bı çı hêzi tên parastın? (1.Pêtr. 1, 5)

Jı kerema xwe, vê qursa İncilê dagırın û jı navnişana jêrin re bışinın:

Hoffnung & Leben
Postfach 101382
D-33513 Bielefeld
Germany
E-Mail: Incilkurd@web.de